Dengê xwe bikarbînin ji bo pêşxistina doza kurdan li Norwec!

Em dengê xwe bidin Erling Folkvord ji bo endametiya parlemanê !

Kurdên ku li Norwec jiyan dikin, dikarin bi tevlêbûna xwe di helbijartinan de mohra xwe li encamên vê helbijartinê bidin. Lê heya niha weke kû pêwist be kurd nekarine bibin fakterek siyasî li wî welatî. Tevlî bûna kurdan dikare roleke xort bibîne li çareseriya pirsgirêka Kurdistanê de.

Pêwîstiya me bi siyasetmedarekî aktiv û dilsozê kû bikare dengê me bigihîne parlemena Norwec (Stortinget). Mixabin heya niha di nav me kurdan de kesek derneketiye ku bikaribe vê rolê bibîne, ji bo vê yekê me elternatîveke xwe yên din derexstiye ku dostek me ye û agahiya wî li ser rewşa kurdan li Norwec û li kurdisanê heye. Ji bo vê yekê jî em Erling Folkvord layîq dibînin û ew ê bikaribe vê berpirsiyaretiyê pêk bîne.

CIMA ERLING FOLKVORD?

1. Ji berku ew dostê kurdane û bi salane li Norweç û Kurdistanê pistgiriya xebata gele kurd dike.
2. Erling siyasetmedarekî jêhatiye û endametiya wî ya di parlemena Norwec yê salên 1993-1997 vê yeke dide diyarkirin. Erling di vê demê de jî hertim xwedî helwest bu li hember rewiş û xwestekên kurdan di hundurî parlemena Norwecê û di dema xwe ya şaredariyê de jî hertim piştgirî daye kurdan li wî welatê.
3. Alîkar û dostê kocber û mafên wan buye.
4. Bi awayekî aktîv û berdewam tevlî civîn û kombunê kurdan bûye.
5. Bi awayekî eşkere, nerastî û duruyetîya hukmetê tîne ziman.

Piştiwanî dide wekhevî û jiyaneke baştir ji bo hemu hemwelatî û kesên ku li Norwec jiyan dikin.

Xwestekên kurdan:

Li Norwec:

1. Piştgîrî ji bo mafên kulturî, awakirina navendeke kulturî û zanyarî ji bo kurdan ji aliyê dewlet ve.
2. Hewil bê dayîn kû di

Erling Folkvord
1. kandidat Rødt Oslo

www.roedt.no

mediya norvecî de behsa kurdan bê kirin û ev bêdengiya dawî lê were.
3. Têkoşîn bê kirin ji bo nasandîna nasnameya kurdan û êdî kurd weke îranî, turk, iraqî û surî neyên naskirin.
4. Rewşa penaber û koçberên kurd bê başkirin.
5. Hewildan ji bo wekheviyê di aliyê xwendin û beşen din yên cûda de û mafên her kesî bê cawaz bê parastîn.
6. Xebat bê kirin ku dewleta Norwec bi awayekî fermî cinosayîd û qetlamên kurdan binase.

REWŞA NAWNETEWÎ Û DOZA KURDAN BI GIŞTÎ:

1. Nasandin û peşxistîna pirsgirekên kurdan li Norwec û piştgirîyên kurdan li çarparçeyên kurdistanê.
2. Tevlêbûn û alîkariya hikumeta norwec ji bo çareserya pirsgirêka kurd li rojhilata navîn de.
3. Tekoşîn ji bo qutkirin û pêşîgirtina alîkariyên Norwec bi welatên dagirkerên Kurdistanê.

Ji bo bidest xistin û pêkanîna wan armancan, bila dengên me wala neçin, helbijartina FOLKVORD ji bo parlemanê pêwiste.

Kampaniya piştgîriya
Erling Folkvord

Profîl: Erling Folkvord

- Di destpêka salên 1970 an de, bi awayekî aktîv di warên siyasî de xwedî rol bûye.
- Di sala 1983 ji bo cara yekem li ser lista RV bû endamê şaredariya Oslo, niha ji ew endamê şaredariyê ye.
- 1993-1997 ketiye parlemena Norwec, di vê demê de jî hertim li ser rewşa kurdan sekiniye û alîgirê kurdan bûye.
- 1984 ji bo cara yekem bo seredan çûye Kurdistanê.
- Folkvord bi komek hevalên xwe yên parlementer tevlî runiştina doza dadgeh kirina siyasetmedara kurd, Leyla Zana ku bi 15 salan cezayê girtîgehê jê re hat dayîn buye.
- Folkvord gelek caran çuye Kurdistanê û gelek geriya ye, ew dibêje ku ev gera buye sedemê vê ku, ew bi gelek kesan di nava tevgera Kurdistanê de bibe dost.
- Di sala 2002 bi hevkariya Veronica Melå a fotograf pirtûkek bi navê Kurdistan nivîsandiye.